

## WERGER Û TAYBETMENDIYÊN WERGÊR



**Demhat Dêriki**

### **Pêşek**

Wergêr wek pêdiviyeyeke giring ku mirovayetî ji xwe re bingeh girtiye di navbera du zimanê cihê de, di cîhana zimanan de bûye rêgezeke têgehiştinê. Bê goman wergêr; perwerdeke, dibistaneke û xwedan rêbazên cihê cihê ye di zanista ziman de. Lê dîroka wergêrê kevîne, ew digehê qonaxên berî peydabûna zimanê nivîskî. Ji dema derketina pir zimana, wergêr jî di jiyana mirovan de wek pêdiviyeyeke lezgîn derket. Ev yek jî bi fêrbûna kesan ji zimanên din re xuyabû. Qonax bi qonax wergêr teşe xwe ya zanistî girt û yên ku di vî karî de kar kirin ku ji wan re gotin wergêr bûne xudanên hindêk taybetmendiyên. Kar û bizavên wergêrê jî pirtûkxanên mîletan dewlemd kirin. Bi riya vî karî, mîletan; çand, huner, wêje, dîrok, floklor, ol, dîtî û jiyana hev naskirin.

### **Dîrok**

Dîroka wergêrê bi dîroka pir zimana ve girêdayî ye. Ji dema pir zimana çêbûn û komên xelkê, êl û qabîlên despêkê bi ser hev ve bûn, wergêr jî derbasî nava wan bû da ku karibin bikevin têkiliyê, ji hev têbigihêjin û peymanî di navbera hev de girêbidin. Anku, ji dema mirov xwe nas kir, têgihîşt, derbasî qonaxa zanîne bû û zimanê cihê derketin, wergêr û pêdiviya wergêrê jî derket. Heger tê gotin û em bibêjin nivîs berî pênc hezar sal des pê kiriye, wê demê wergêra devkî berî pênc hezar sale û dibe ku dîroka xwe diçe heta heşt-deh hezar sal berî zayînê. Destnîşana van mijûyan jî, meretona bi hezarê

salan ya dîroka pêşketina mirovayetiye ye. Nexwe werger dibe du beş: 1. Wergera devkî 2. Wergera nivîskî. Ev her du beş her yek ji wan xwedan merc û qonaxekêye û her yek ji wan xwedan komek pirsgrêke. Her yek ji wan teknîk û arîşên xwe cudane.

Lê pêşketina wergerê di dîrokê de (qonaxên despêkê), piranî bi riya olan çêbûye. Ji bo endamên olan û nivîskar û hişmendên wan da ku karibin cîhana ola xwe bi xelkê bidin naskirin û wan bikin bin bandore raman û dîtinên xwe, dest avêtine karê wergerê û berhemên olî ji zimanê xwe wergirandina zimanên din. Bi taybetî ev kar Dêr pê radibûn. Nimûneyên wergerê di dîroka Yunana kevin û Mîsrê de pirin. Lê di qonaxa qirnê dehan de Bexda bû cihekî giring û heta dikarim bibêjim ku bû navenda wergerê. Gelek berhem ji Yunanî kirin zimanê erebî û ji van wergeran zanyar û nivîskarên ereb pir mifa jê dîtin. Paşê, ji erebî gelek berhem kirin latînî û yek ji van welatan Spaniya ye. Dema li sala 1450-e çapxana peyda bû, lez û bez kete karê wergerê. Di qirnê nozdê de û piştî şoreşa pêşeyî, karê wergerê kûrtir bû, berferhtir bû û ev kar bêhtir bi zanistî hate kirin. Lê, piştî şerê cîhanê yê duyem, werger û karê wergerê derbasî qonaxeke nû bû ku ev qonax ji hemû qonaxên din dewlemendtir bû.

### **Taybetmendiyên wergêr**

Ew kesê ku berhemekê, bûyerekê, daxuyaniyekê, yan nûçeyekê (çi devkî û çi nivîskî) ji zimanekî din bike zimanekî din, yan derbasî zimanekî din bike (nimûne: Kurdî bike îngilîzî, îngilîzî bike kurdî û hwd.) û ew pisporê vî karî be û bi pisporê karê xwe bike, jê re dibêjin wergêr. Lê, divê wergêr xwedan taybetmendiyên karê xwe be û pêdiviye ev saxlet li cem hebin:

- 1-Divê li cem wî/wê (wergêr) çand û hunera her du zimana hebe. Pêwîste pêzanîn li ser dîrok û jiyana her du miletan hebin.
- 2- Divê beşê ku tê de wergerê dike pispor be
- 3- Divê di karê xwe de hişmend be û hiş xurt be, di têgehiştinê de sivik be
- 4- Divê di teknîka wergerê de kûr be, zana û pispor be
- 5- Divê di her du zimanan de desthilatdar be

### **Kurd û werger**

Dîroka mîletê kurd di mijara wergerê û wergêr de pir lewaze. Di vî warî de kurd hejarin. Ev lawazbûn û hejarî bi dîroka mîletê kurd ya bindestî, talan û komkujiyên siyaseta sor û sipî ve girêdayî ye. Ger li

serdemên kevin di vî warî de hindêk pêngav hatibin avêtin jî, ew ji aliyê dijminên wan ve hatine sotin! Pir sedemên siyasî, olî û ramanî hene ku pirtûkxana kurdan vala hiştine. Lê, ew demek bû û em pir caran egerên wan deman dihînin ziman. Ez dixwazim li ser rewşa îro rawestim û ka em rewşa wergerê di roja îro de, bibînin ka di çi astê de ye.

Bi taybetî dixwazim li ser başûrê Kurdistanê bisekinim, ji ber ku îro başûrê Kurdistanê nîv dewleteke û pir derfet li vir hene ku karek bi rêk û pêk bihête kirin di warê wergerê de. Li herêma Soran û Behdînan piranî di aliyê filmên ku li ser kanalên kurdî dihên pêşkêşkirin, di wergera nivîskî de hindêk gav dihên avêtin, li mixabin her pît dîsa bi erebîne, wergera devkî jî, berhem bi tiliyan dihên jimartin û ev werger bi zaraveyên soranî û bi kurmanciya devoka Behdînan ve sînorkirî maye, anku bi milyonan kurdên parçên din yê Kurdistanê başe baş mifayê ji van berheman nabînin (ev jî girêdayî pirsgerêkên me yê zimanin). Di wergera çend pirtûkan de jî, her rewş eve. Ya kembaxtir û aloztir piraniya van berheman ji wergera wergerê hatine wergerandin bo zimanê kurdî. Gelek nivîskarên bakurê Kurdistanê berheman ji tirkî werdigerînin kurdî, lê koka van berheman ya Îngilîzî ne, yan Elmanî ne, yan Rûsî ne, yan jî Fransî ne. Mebest li vir ewe ku berhem yekser ji koka xwe, ji zimanê xwe bihête wergerandin ji bo zimanê kurdî. Dema werger ji wergerê bihê kirin pir arîşe derdikevin, wek pir caran hevok tam nayê, peyv ji wateya xwe derdikevin, ew çêja xwendinê ya balkêş namîne, hindêk têgeh berûvajî dibin û xwendevan ji têgehiştineke rast, dûr dikeve. Demek li ber çave ku em kurd di wergerê de pir lawazin û heta em giringiyeke zêde nadin wergerê. Lê ev şaşitiyeke mezine, miletan bi wergera berheman pirtûxanên xwe dewlemend kirine, zimanê xwe zindî kirine û pêş xistine. Îro wek derfet û merc li herêma Kurdistanê hene li çi parçên din yê Kurdistanê nîne, lewma divê hukumeta Kurdistanê vî karî di nava hindêk nivîskaran de derxê pêş û kadir û xebatkarên vî karî ava bike. Lê, divê neyê jibîrkirin ku wergerên bihêne kirin ji jêdera zimanê berheman bi xwe be û ev werger xizmeta parçên din yê Kurdistanê bike. Anku, bila werger biçûk neyê dîtîn, neyê piştguhkirin, neyê jibîrkirin û hukumeta Kurdistanê dezgehekê ji bo vî karî ava bike û ev dezgeh di bin çavdêriya kesên pisporê vî karî de xebata xwe bi rê ve bibe û bila ev kar parçên din yê Kurdistanê di hembêza xwe de helgirê. Ji ber ku pêdiviya miletê kurd bi pêngaveke wesa heye.